

AMNESTY INTERNATIONAL
(Sazîya Lêborînê ya Navneteweyî)
DAXUYANÎYA ÇAPEMENÎYÊ

7 Îlon 2015

Sûriye: Binçavkirinên keyfî û darizandinên ne rewşa yê berbiçav şerê PYDê yê li dijî terorîzmê qirêj dikin

Amnesty International dibêje, birêvebirîya otonom a li bakurê Sûriyê ku Partîya Yekîtiya Demokrat (PYD) jê re serkêşiyê dike, çewisandina li ser terorîzmê û koma çekdar a ku ji xwe re Dewleta Îslamî (DÎ) dibêje, wek hêncet bi kar tîne ku rexnegirên aştîxwaz û sivîlên ku bawer dikin ku dilxwaz an endamên xwedêgiravî komên terorê ne, bi awayên neqanûnî binçav bike û bi awayekî ne rewşa darizîne.

Lêkolîneran li bakurê Sûriyê di dema mîsyoneke dîtina rasteqînîyan de bi 10 girtîyan re hevpeyvîn pêk anîn, ev girtî du girtîgehên ku ji aliyê birêvebirîya otonom a bi serkêşîya PYDê tên birêvbirin de bûn.

Hin kes bêyî tawanbarkirin an darizandin heta salekê bi awayekî keyfî binçavkirî mane. Ewên ku derketine ber dadgehê digotin ku berî darizandinê demeke dirêj binçavkirî mane û pêvajoya berbiçav ne rewşa bûne. Mafên wan ên bingehîn hatine piştguhkirin, ku mafê xwe parastinê, dîtina delîlên li dijî wan û dîtina parêzer û malbatê di nav wan de ne.

Lama Fakiha Şewirdara Bilind ê Krîzan li Amnesty International weha digot, "Birêvebirîya otonom a bi serkêşîya PYDê nikane şerê xwe yê li dijî terorîzmê wek hêncetekê ji bo bînpêkirina mafên takekesên li herêmên di bin kontrola wan de bi kar bîne."

"Bi navê ewlekarîyê bikaranîna taktîkên weha tund, ên wek li gora nêrîn an nezelaîya endametîyê, bêdelîl binçavkirina gumanbaran wê muhtemelen tenê bi şûn ve bipekin û bi kêrî çêtirkirina ewlekarîyê nayên. Sûcê îdiakirî çî dibe bila be, divê mafên bingehîn ên girtîyan ên darizandineke rewşa û ku bi awayên keyfî neyên binçavkirin, werin parastin."

Birêvebirîya otonom a bi serkêşîya PYDê piştî vekişîna hêzên hikûmeta Sûriyê ji 2014an û vir ve hin beşên bakurê Sûriyê bi rê ve birine. Hêzên polîs, dadgeh, girtîgeh û qanûnên wê bi xwe hene.

Herêma di bin kontrola birêvebirîya bi serkêşîya PYDê de bûye armanca êrîşên domdar ên Dewleta Îslamî. Li gel armanckirina Asayîş û pozîsyonên ewlekarîyê yê YPG (hêzên di bin kontrola PYDê de), Dewleta Îslamî her weha yekser sivîlên li

herêmên di bin kontrola hikûmeta bi serkêşîya PYDê de jî armanc kirine; rûniştî kuştine, ji cîhên wan rakirine û revandine.

Di 2014an de, birêvebirîyê qanûneke nuh a dijî terorîzmê pejirand ku ji bo binçavkirin û peyketina gumanbarên terorîzmê bi kar anîye.

Wek desgeheke de-fakto a hikumran, birêvebirîya otonom a PYDê mecbûr e ku di binçavkirina keyfî û pêdivîya bicîhanîna darizandinên rewa de ji qanûna mafên mirovan a navneteweyî û qanûna mirovhezîyê ya navneteweyî re rêzê bigire.

Lê belê gelek girtîyên hevpeyvînkirî ji ber kiryarên ku wek sûcên krîmînal nehatine naskirin hatine tewqîfkirin - û gelek caran li dijî wan delîlên xerabkarîya krîmînal tunebûne. Hinek girtî ji wan re qet nehatiye gotin ku bi çî sûcan hatine tawanbarkirin an neçûne ber dozgerê gel an dadgêrê. Ji pênc girtîyên bi sedemên terorîzmê cezaxwarî çaran got ku piştî darizandinên pir nerewa bêyî delîlên piştrastkir yên sûcên wan hatine cezakirin.

Binçavkirinên keyfî

Hejmareke binçavkirîyan ji Amnesty International re got ku bi hewesekê, bi kêmdelîlan, wek cezakirina bi aştîxwazî dijberî yan rexnekirina rayedarên PYDê hatine binçavkirin an wek meyla bi ser komên terorîst hatine dîtin.

Fahed, 65, girtîyekî Ereb ji bajarê Hesekî ku li gel sê kurên xwe sê mehan hatiye binçavkirin, ji Amnesty International re got ku Asayîş – polîsê herêmî – ew girtine ji ber ku merivên bûka wî bi ser Dewleta Îslamî ve ne; wî got ku her çend wî bi xwe bi komê re tu têkilî an girêdan pêkneanîbin jî.

Di dozeke din de, Omer, 30, Erebekî ji Hesekî got ku ew nêzîkî mehekê girtî hat hiştin û bi terorîstbûnê hat tawanbarkirin, ji ber ku navê wî dişibîya yê zilamekî ku lê digerîyan. Wî ji Amnesty International re got ku tu delîlên din li dijî wî nehatin pêşkêşkirin. Omer got ku bêtir ji dozdeh Erebên din ên ji Hesekî ku ew nas dike ji ber şikkirina çalakîya terorîst hatibûn girtin û berî ku ji ber nebûna delîlên li dijî wan werin berdan, 15-20 rojan girtî hatibûn hiştin.

Malek, 35, Erebekî ji Reqayê ji Amnesty International re got ku ew bi terorîzmê hat sûcdarkirin, lê delîlên li dijî wî tenê ew bûn ku di Facebookê de bi awayekî ne gefxur an ne tund û tûj PYD rexne kiribû.

Hêzên Asayîşê her weha qanûna dijî terorîzmê ji bo girtin û peyketina komên Kurdan ên rexnegirên PYDê jî bi kar anîye. Partîya Demokrat a Kurdistan – Sûrîye, partîyeke Kurdan a dijber, ji Amnesty International re got ku li Efrînê ku ew jî di bin kontrola birêvebirîya bi serkêşîya PYDê de ye, 12 endamên partîya wan di 2014an de bi awayekî keyfî hatin girtin û bêyî delîlên piştrastkirî ji ber pêkanîna kiryarên terorîst ceza xwarin.

Amnesty International bang li birêvebirîya otonom a bi serkêşîya PYDê dike ku tewqîfkirinên keyfî bi dawî bîne û hemû girtîyên bi awayên ne qanûnî desteserkirî serbest bikin. Heke fermaneke girtinê tunebe, yan ne ji bo rawestandina pêşveçûna sûcan be, divê tewqîf neyê pêkanîn. Tewqîfên keyfî bi Peymana Civakî ya birêvebirîyê bi xwe re jî di nav nakokîyê de ye -dokumenteke destûrî ya di Çileyê 2015an de pêkhatî ku mafê bi awayê keyfî binçavnekirinê garantî dike.

Hemû girtîyên ku bi terorîzmê hatibûn tawanbarkirin û ji aliyê Amnesty International ve hatin hevpeyvînkirin got ku şert û mercên wan ên girtîbûna li girtîgehên navendî têrkir bûne. Lêkolîneran çavdêrî kir ku hucreyên girtîgehan ne zêde qerebalix bûn û bi nivîn, ronîkirina têrkir û tesîsên serşokan baş rapêçandî bûn. Girtîyan îdia nekirin ku muameleya xerab dîtine li girtîgehên navendî yên serdayî. Wan got ku rojê sê xwarinan werdigirin, destûr heye ku rojê qet nebe seetekê li hewşên girtîgehê bin, dema ku pêwîst be ji wan re tedawîya tibbî peyde dibe, û mafê wan heye ku her hefte endamekî malbatê were serdanê û her hefte carekê telefon bikin.

Lê belê du girtîyan rave kir ku li tesîsên binçavkirina berî darizandinê yên li Amûdê, navçeyeke li bakurê rojhilatê Sûriyê nêzîkî sînorê Tirkîyê, şert û mercên xerab û muameleya xerab hebûne. Mohamad (ji bo parastina kesên hevpeyvînkirî nav hatine guherandin) ji Tebaxa 2014an û pey ve şeş mehan li Amûdê girtî maye. Wî got ku wî bi 12 kesên din re hucreyeke bin erdê parve kiriye. Meha yekemîn nehatiye hiştin ku avê li xwe bike yan biçê derve yan rojê bibîne. Her weha ji ber ku berê li herêmeke di bin kontrola Dewleta Îslamî de rûniştiye, parêzvanên girtîgehê heqareta devkî lê kiriye.

Wî weha got, “Parêzvanên girtîgehê ji ber ku ez bi piştevanîya Dewleta Îslamî hatim tawanbarkirin ez piçûk xistim. Ji min re gotin ku hêja ye ku ez ji girtîbûna hucreya bin erdê xerabtir muamelê bibînim.” Girtîyekî din ê li heman cîhî mayî û cîhê-hevpeyvînkirî got ku wî heman muameleya xerab û heqaret dîtîye.

Girtîhiştina dirêjkirî ya berî darizandinê û darizandinên berbiçav ne rew

Çend binçavkirîyan ji Amnesty International re got ku ew ji bo demên heta salekê bê darizandin li girtîgehên berî darizandinê mane. Hinan got ku tu carî bi awayekî fermî nehatine tawanbarkirin û tu carî dozgerêkî gel nedîtine yan neçûne girtîgehê.

Mînaeke weha Safwan bû, hemwelatîyekî biyanî ku dema ku bi Amnesty International re peyivî, hema hema salekê bêyî ku were tawanbarkirin, dozgerêkî gel bibîne an derkeve ber dadgêrekî, girtî mabû. Li gora rêznameyên PYDê bi xwe jî, girtîyên berî darizandinê berî ku ji aliyê dozgerêkî gel ve bîn tawanbarkirin û ji

bo payina darizandinê ji bo girtîgeheke navendî bîn transferkirin, divê herî pir 72 seetan binçavkirî bîn hiştin.

Binçavkirîyekî, Issam, ji Amnesty International re got ku di rêya Reqayê de ji aliyê Dewleta Îslamî ve hat revandin û zor lê hat kirin ku cîhê kontrolgeha YPGê bide wan. Wî weha got, “Min di demê de xwe gîhand Asayîşê ku pêşî li êrîşê bigirin. Dibe ku ez sûcdar bim, lê min darizandineke rewa hevî dikir.” Li şûna wê şeş mehan li girtîgeha berî darizandinê ma, û berî ku jê re heft sal ceza girtîgehê û heft sal ceza sirgûnê bê dayin, jê re nehat gotin ku bi çi hatiye tawanbarkirin. Wî weha got, “Di odeyekê de dadgêrekî bêyî parêzerekî an derfeta ku ez xwe biparêzim, ceza da min.”

Mohamad, ku di Tebaxa 2014an de hat girtin jî darizandineke ne rewa rave dike. Wî weha got. “Pirsker ji min re got ku ez masûm im û ez ê di 15 rojan de bêm berdan... Li şûna wê, piştî ku min dadgêrek ji bo 10 deqîqan dît, ez bi 10 salên girtîgehê hatim cezakirin. Dadgêr delîlê li dijî min ên di destê wan de raber nekir.”

Di dozekê de, girtîyekî sivil li dadgeheke leşkerî hat darizandin.

Li gel îdiayên Ciwan Îbrehîmê Direktorê Asayîşê, ku ji bo girtîyan derfeta dîtina parêzerekî heye û ku piştî girtinê ji malbata wan re tê gotin ku li ku derê ne û piştî ku lêpîrsîn diqedin (pirê caran nêzîkî mehekê), destûrê didin ku wan bibînin, gelek girtîyan got ku daxwaza wan a parêzerekî hatiye piştguhkirin û bi mehan ji ragihandina bi malbatên xwe bêpar mane. Tenê girtîyekî hevpeyvînkirî got ku wî parêzerek hebû.

Fakih weha got, “Zelal e ku gelek girtî rûbirûyî darizandinên berbiçav ne rewa bûne, mafên wan bi giranî bînpê bûne. Divê mafê her kesî hebe ku li ber dadgeheke rewa xwe biparêze. Li şûna seranser bînpêkirina mafên mirovan li ser navê ewlekarî û dij-terorîzmê, divê birêvebirîya bi serkêşîya PYDê bi cîh bike ku ji mafên girtîyan re rêz tê girtin.” Divê hemû girtî tavilê derkevin ber dadgêrekî, ji wan re tawanbarîyên li dijî wan bîn gotin û bihêlin ku bi parêzerekî û malbata xwe re têkilîyê çêkin. Divê sivil tu carî ji aliyê dadgehên leşkerî ve neyên darizandin.

Piştgeh

Amnesty International di Tebaxa 2015an de çû serdana du girtîgehên navendî yên li Qamişlo û Melîkîyê yên di bin kontrola Asayîşa hêza polîs a birêvebirîya bi serkêşîya PYDê de. Li her du tesîsan jî, lêkoleran kanîbûn bi girtîyên ku dixwestin re bipeyivîna û bêyî amadebûna karmendên fermî bi wan re hevpeyvîn pêk bianîna.

Li sê girtîgehên navendî yên li kantona Cizîrê li dor 125 girtî hene: Li gora Abîr Mihemed Xalidê Gerînendeyê Girtîgehan ê Asayîşê, Qamişlo, Dirbêsîye û Melîkîye.

Ciwan Îbrehîmê gerînendeyê Asayîşê ji Amnesty International re got ku li seranserî her sê kantonên di bin kontrola PYDê de bi qasî 400 girtî hene.

Di 2014an de, PYD li gel hejmarek partîyên sîyasî yê piçûk li sê kantonên bi giranî Kurd ên li bakurê Sûrîyê birêvebirîyeke otonom bi cîh kir: Efrîn, Cizîr (li wîlayeta Hesekî) û Kobanî (Eyn al-Ereb). Hêza polîs, dadgeh, girtîgeh, wezaret û qanûnên birêvebirîya bi serkêşîya PYDê hene. PYD her weha artêşek jî saz kiriye, Yekîneyên Parastina Gel (YPG), bi giranî ji parastina xaka di bin destê Kurdan de û birêvebirina dadgehên leşkerî berpirs e.

Dokumenta Gelêrî

Ji bo bêtir agahîyê, ji kerema xwe telefonî ofîsa Amnesty International a li Londonê, KY, bikin:

+44 20 7413 5566 an +44 (0) 777 847 2126

email: press@amnesty.org

twitter: @amnestypress

International Secretariat, Amnesty International, 1 Easton St., London WC1X ODW, UK